

Destûra Weqfa Jemal/Cemal Nebez

Pêşgotin

Weqfa li ser navê Cemal Nebez (Jemal Nebez) damezrandî li ser hîmê berhemên Cemal Nebez bi xwe ava ye; wî welatê xwe Başûrê Kurdistanê sala 1960î bi cih hiştibû û 8ê Kanûna 2018ê li Berlînê wefat kiribû, ew 21'ê heman mehê li bajarê xwe Silêmanîyê hat veşartin. Li Berlînê li goristanekê bîrdariyek ji bo wî hatîye danîn. Weqfa Cemal Nebez nexasim hat damezrandin da ku berhemên wî li pey xwe hiştî, hem yên weşandî û hem jî yên neweşandî weke çavkanî li xelkê vekin û bikin ku ji bo nifşên bê jî bê parastin.

Cemal Nebez sala 1933yê weke zarokê malbateke kurd hat dinê. Bavê wî ew ji nav xwişk û birayan neqand da ku bike ku ew bi perwerdeyeke xasma qedirpêdayî mezin bibe. Ji zarokatîyê ve ew dest pê dike û hînî gelek zimanên rojhilatî dibe û paşê bi xêra mamosteyên taybet zûzûka wêjeyên van zimanan jî nas dike. Xwendineke taybet a Quranê jî beşek ji ve xwendina li kêleka xwendina dibistanê dewam dikir. Di vê çarçoveyê de Cemal Nebezê mezin dibû, dikarî elaqeyên xwe jî dîyar bike. Tevî ku bavê wî xwendina tibê tercîh dikir ji bo wî, çaxê Cemal got, ew dixwaze fîzîk û matematîkê bixwîne, wî daxwaza kurê xwe erê kir. Piştî mirina bi carekê ya bavê xwe, bi xwişk û birayên xwe re li hev kir û dest bi xwendina beşa mamostetîya dibistanên amadeyî kir. Hem weke xwendekar û hem jî weke mamosteyê ciwan ê dibistana amadeyî gava ku li gelek deverên Iraqê yên ereban hat wezîfedarkirin, ewqasî xwedî taqet bû ku di ber karê xwe re wî dikarî weke nivîskar jî mijûl be. Xwişk û birayên wî hingê pê re bûn alîkar ku ew xebatên wî – yên ku hingê jî li ser gelek dsîplînên cihê bûn – di wan şertên zehmet ên hingê de karibin bîn weşandin. Gava ku Cemal Nebez weke xwendekarekî bi xwe debara xwe dikir, hat Elmanyayê, li welatê xwe ew bi nav û deng bûbû jî. Li Elmanyayê wî dest bi xwendina beşa Îrannasîyê kir ku wî bi xwe mesrefên xwe didan, piştî wî ji bo Civaka Lêkolînê ya Elman (DFG) lêkolînek kir û li gelek zanîngehên elman wî ders dan. Piştî bi çend salan bi pêvajoya normal ew bû welatîyê elman. Çawa ku hat Elmanyayê wî dest pê kir ku rêûresma zanistî ya kurdolojîyê ya ewrûpî ya ji sedsala 19ê mayî, vejîne – û wî ew dewlemend kir, serê pêşî çawa li jor me behsa wê kir, di çarçoveya sazûnmanî de, piştî jî bi karê xwe yê serbest û bi nivîsên xwe yên li welat û derveyî welêt hatin weşandin, bi temamî wî bêhtirî 100 berhemî bi gelek zimanan û li ser dsîplînên cihê belav kirin.

Weqfa Cemal Nebez weke weqfeke kurdan û ji bo kurdan tevahîya maldarîya kesê navê xwe lê kirî werdigire, her wiha qismekî ji maldarîya hevjîna wî Hannelore Küchler jî werdigire û bi vî awayî ew ê di çarçoveyeke mutewazî de ji ferz û zextên hebûnî azad li gorî ruhê Cemal Nebez ê ku serê pêşî mirovekî hez ji azadîyê dike, mirovekî nihêrîna wî fireh û li dinyayê vekirî bû, karibe tesîrê bike. Ew tevî vê, fikirkerekî çê û lêkolînerêkî bi bertîlê nexape bû yê ku di zemanê xwe yê li jîyanê de ji bo mafên milletê kurd, ji bo welatê xwe yê yekbûyî Kurdistanê israr kir. Weqfa ku li ser navê wî hatîye damezrandin, berîya her tiştî destekê dide projeyên wisa yên lêkolîn û wergerê yên ku bi berhem, jîyan û zemanê wî dadikevin. Wekî din weqf weke erka xwe ya taybet dibîne ku li gorî taqet û qeweta xwe alîkarîyê bike bi lêkolînên wêdetir ên li ser rewşa heyî ya kurdan li welêt û derveyî welêt, her wiha bi lêkolînên ziman, dîrok, huner û çanda wan tevî rêûresmên zanist û perwerdehîyê.

Weqf pirzimanî ye û meyla wê li ser navneteweyîbûnê ye. Ew di bijartina babet û çalakîyên xwe de serbixwe ye. Tesîreke li vê bi rêya partîyên sîyasî yan jî hêzên din ên ji derve, nabe. Çawa ku xwedîyê navê wê, mexdûrîyet û cudakerîya li bêgunehan nekarî bêdeng qebûl bike, weqf jî weke ferza li ser xwe dibîne ku wan mirovên bêguneh ên hewce û mezlûm di rewşeke zehmet de tenê nehêle, berevajî vê, timî bi awayekî biezîm îşaret bi rewşa wan bike.

§ 1

Nav, formê hiqûqî, war

Navê weqfê, Weqfa Cemal Nebez e.

Ew weqfeke di warê hiqûqî de li ber Qanûna Medenî berpîrsîyar e û warê wê jî Berlîn e.

§ 2

Armanç

(1) Armanca weqfê teşwîqkirina zanist û lêkolînê, perwerdehîya millet û ya pîşeyî her wiha ya huner û çandê ye.

(2) Armanca weqfê nexasim tê bicihanîn bi

1. çêkirina fêhristeke pirzimanî ya berhemên xwedîyê navê weqfê, her wiha bi rêya katalogkirineke profesyonel a kitêbxaneyê wî ya lêkolînê (tê de berhemên çavkanî/ferheng, monografî, kovar û "lîteratura cûn [ji bo berhemên çapa taybet, yên xwendekar, sazî dezgeh û şirketan tê bikaranîn]") ya ku di mekanê milkê weqfê bi xwe yê li Berlîn-Wilmersdorfê (Spichernstraße 15, 10777 Berlin) de pirtûkxaneyê li cihê cihê sîd bê wergirtinê wê bê amadekirin, serê pêşî bi du cihên kar û saetên dîyar ên vekirinê.

2. fêhristkirina profesyonel a destxetên ji mîrîsa xwedîyê navê weqfê (rojnivîsk, name, destnivîs), di nava wan de destnivîsên neweşandî, yan jî metnên bi daktîloyê nivîsandî (yên wî bi xwe jî û yên ji wî re ji bo nirxandinê/agahdarkirinê hatine şandin jî hene). Ev fêhristkirin (çêkirina lîsteya materyalên li ber dest/bi awayekî pisporane parastina wan) şert û mercan diafirîne ji bo bikaranîna van materyalan ji bo projeyên lêkolînê yên siberojê;

3. Hevkarîya bi muzexaneyê re ku li bajarê lê hatî dinê yê xwedîyê navê weqfê ava dibe (li mala berê ya malbata wî) û wê hem berhemên wî nîşan bide û hem jî bibe cihêkî civanê.

Weqfa Cemal Nebez hazir e ku beşekê ji mîrasa zanyarê ku li welatê xwe Başûrê Kurdistanê bi qedrê wî tê zanîn, ji muzeyê re bihêle yan jî demkî bidîyê. Bi her halî, hevkarîya bi Muzeya Cemal Nebez a li Silêmanîyê re derfetên têkilîyên binirx ên çandî wê ji bo weqfê mumkin bike;

4. teklîfa kar ji bo karên zanistî (çi projeyên lêkolînê, çi jî karên din ên zanistî) ji xebatkarên alîkar re li gorî § 57 Abs. 1 Satz 2 AO [AO=Nîzama Bacê] li ser babetên dîyar ên ku weqf ji bo wan jî li kesên xwe bidin ber lêkolînê yên jêhatî û alîkarên/sponsorên di warê darayî de xurt digere, yên ku elaqeya wan ji mijarekê re heye û dixwazin projeya lêkolînê – bi rengê ku weqfê terîf kirîye – bibin serî;

5. civata Giştî ya Salane ya weqfê ku di heman demê de çalakîyeke çandî ye tevî muzîka zindî û bernameya çandê, tevî gotarên multî medya, wê timî destpêka Qanûnê (rojbuha xwedîyê navê weqfê 01.12. û roja wefata wî 08.12. e) pêk bê. Ji bilî rapora rêveberîyê li ser xebatên sala bihurî û bernameya sala bê, Civata Giştî ya Salane bi kêra wê jî tê ku hawîrdora destekker a weqfê derêxe pêş, ya ku temamê salê bi hevaltîya kurd û elman tesîr kirîye û li gorî wê jî divê mirov bi qedrê wê zanibe;

6. pêşkêşkirina derfeta li weqfê temamkirina stajekê nexasim ji bo ciwanên civaka kurd li Berlînê û li Elmanyayê. Gava ku weqf personel ji bo demeke dîyarkirî bi peymanê bigire kar yan jî karekî bide, hingê wê bide hevkarên wisa ku ji berê ve jêhatî bin di warê miameleya bi awayekî pedagojîk yan jî pedagojîya li gorî mezinan de wisa jî miamele bi stajerên weqfê re bikin, wan pisporane wezîfedar bikin, weke nimûne ji bo birêveberîya çalakîyan, dîzayna malperê û miqatebûna lê, miqatebûn û parastina şunwaran, karê ji bo raya giştî, katalogkirin û arşivkirinê;

7. xwe dana ber amadebûna weqfê ya ji bo gerîna li sponsorên guncaw ji bo fînansekirina bursên ji bo nexasim mirovên Kurd ên behremend û jêhatî û miqatebûna li îdareya teknîk a van bursan. Weqf wê wekî din bi peydakirina mamosteyên rêber ên guncaw, her wiha bi birêxistinkirina civîn/bihevrepeyivîna bursîyeran li mekanê weqfê bixwe yan jî di ser înternetê re piştta bursîyeran bigire;

8. bicihkirin û dana Xelata Zanistê ya Cemal Nebez. Di rewşa bêqisûr de serê du salan carekê ev xelat wê bê dayîn herî kêr di yekê ji van branşên li jêr de: Sîyaset, Hiqûq, Dîrok, Zimanzanî, Huner, Muzîk, Matemetîk, Tib, Zanistên Fenê. Bi vê armancê wê komîteyek bê avakirin ku wê peywendîyan dayne bi pisporên dîyarker ên li welêt û derveyî welêt re, li xebatên hêja ne mirov wan teşwîq bike bigere û pêşniyazan amade bike ji bo karên bîxelatkirin. Bijartina xelatgirê/î divê bi sedeman bê ravekirin;

(3) Encamên zanistî hemû (çi ji lêkolînê û çi jî ji karên din ên zanistî) wê ji alîyê weqfê ve aktuel bîn weşandin; çalakîyên weqfê hemû li xelkê vekirî ne.

(4) Weqf divê bi awayekî maqûl miqatebûn û parastina bîrdarîya xwedîyê navê weqfê bigire ser xwe (ku ji niha ve li Goristaneke li Berlînê weke beşek ji cihê bijartî ya malbatî ya xwedîya weqfê hatîye avakirin). Piştî wefata xwedîya weqfê û di cer de veşartina wê li heman cihê bijartî, divê weqf her wiha li gora xwedîya weqfê jî xwedî

derkeve û wê biparêze. Weqf dikare ji bo vê herî zêde ji 3 paran 1'ê dahata xwe bi kar bîne.

(5) Heqekî qanûnî li ser terxankirina derfetên darayî yên weqfê ti nîne.

(6) Weqf bi tamamî, bi tenê armancên yekser ên li xêra xelkê li gorî beşa "armancên bi îmtiyazên bacê" ya Nîzama Bacê (AO) dide ber xwe.

(7) Weqf bi xwebexşî kar dike; ew armancên ji bo aboriya xwe li pêşîya herî pêş nagire.

(8) Ne lazim e weqf ji bo bicihanîna armancê xwe di heman demê de û bi heman mîqdarê di beşên teşwîqê yên xwedî îmtiyazên bacê li gorî paragrafa 2'yê çalak be. Weqf serbest e bibijêre ka wê kîjan armancên xwe bi kîjan tevdiran bibe serî.

§3

Mal, bikaranîna derfetên darayî

(1) Malê weqfê kêlîya qebûlkirina weqfê ji mueseseya weqfê xwe dide der.

(2) Malê weqfê di dewama xwe de hukmî û îtîbarî divê bêyî ku kêmbibe, bê parastin. Li malê weqfê ew terxankirinên ku ji bo vê hatine dîyarkirin, zêde dibin; ji mafên weqfê ye ku weqfêkirinên bi vî rengî qebûl bike. Ew her wiha dikare terxankirinên bêyî dîyarkirina armancê ji ber amadekirina ji ber mirina kesekî, danehevên îhtiyatî yên li gorî § 62 bend 1 Hejmar 3 ya AO'yê û pereyê zêde yan jî karên di § 62 bend 4 a AO'yê de behsa wan hatîye kirin li malê weqfê zêde bike.

(3) Malê weqfê di hin salan de dikare heta bi 5 ji sedê mîqdara sala berîya wê bê bikaranîn bi şertê ku Desteya Şêwirmendîyê berîya wê bi biryara erê ya tevahîya beşdarên biryardayîne erê kiribe ku wergirtina mîqdarê ji bo bicihanîna armanca weqfê bi awayekî lezgîn pêwîst e; vegerandina vê mîqdarê li malê weqfê di vê di nava sala darayî ya paşê de bê misogerkirin.

(4) Dahatên ji maldarîya weqfê û terxankirinên li wê nayên zêdekirin ji bo bicihanîna armancên weqfê tîn bikaranîn.

(5) Destûra danehevên îhtiyatî heye, heger bi vê yekê zirar li îmtiyazên bacê yên weqfê nebin.

(6) Derfetên darayî yên weqfê dikarin tenê ji bo armancên li gorî destûra weqfê bi xwe bîn bikaranîn. Nabe ku bi mesrefên ne ji armancên weqfê, yan jî peredayîneke zêdeyî hed mêza kesekî bê girtin.

§4
Dezgehên weqfê

(1) Dezgehên weqfê ev in

1. Rêveberî,
2. Desteya Şêwirmendîyê.

(2) Endamê dezgehekê nabe ku di heman demê de endamê dezgeha din jî be.

§5
Rêveberî, serok

(1) Rêveberî herî kêr ji 2 endaman pêk tê. Endamên rêveberîyê wê li gorî paragrafa 2'yê ji bo erkeke 5 salan bîn destnîşankirin; xwedîya weqfê heta sax e tê wezîfedarkirin. Rêveberîya pêşî di dema karê mueseseya weqfê de tê wezîfedar kirin. Endamên rêveberîya pêşî ya ji bo karê mueseseya weqfê wezîfedarkirî erka xwe xwebexş û bêpere dikin. Lê belê heqê wan e ku bixwazin mesrefên wan ên ji bo karê wan pêwîst, bîn tezmînkirin. Endamên din ên rêveberîyê heger derfetên darayî destûrê bidin, ji bo karê xwe pereyekî distînin. Mîqdara vê jî ji bo tevahîya endamên rêveberîyê di ser hev de 0,4 ji sedê maldarîya salê ya nesafî ya weqfê ye.

(2) Heta ku xwedîya weqfê sax e, divê ew tavilê şûna endamên rêveberîyê yên vediqetin, dagire. Piştî wefata xwedîya weqfê, heger wê hejmar kêmtir be ji hejmara herî kêr a endamên rêveberîyê, Desteya Şêwirmendîyê tevî rêveberîya mayî şûna endamên ji rêveberîyê veqetîyayî dadigire. Serok yan jî cîgira/ê serokê/î bi vê armancê divê tavilê bang bikin ji bo ku civîneke hevpar a Desteya Şêwirmendîyê û Rêveberîyê çêbe. Ev civata hanê dikare biryarê bide, heger rêveberîya mayî û herî kêr nîvê endamên Desteya Rêveber amade bin. Ji bo hildibijartina endameke/î nû ya/yê rêveberîyê piraniyeke besît a beşdarên civînê têrê dike.

(3) Piştî ku dema erkê qedîya, heger wê hejmara endamên wê ji hejmara herî kêr ya rêveberîyê kêmtir be, endamên rêveberîyê heta ku rêveberîya xelefî wan dest bi erka xwe bike, erka xwe dewam bikin. Heger berîya ku dema erka wan biqede endamên rêveberîyê dev ji wezîfeya xwe berdî û ji ber vê yekê hejmara endamên rêveberîyê ji hejmara herî kêr a rêveberîyê kêmtir bibe, hingê ew endama/ê mayî ya/yê rêveberîyê wê heta ku hejmara rêveberîyê tamam bibe, bi tena serê xwe rêveberî be.

(4) Rêveberî ji nava xwe serokekê/î û cîgireke/î serokê/î hildibijêre.

§6

Biryardayîna rêveberîyê

(1) Rêveberî biryarên xwe di civînan de yan jî bi rêya dengdayîna nivîskî dide. Serok yan jî Cîgira/ê Serokê/î, endamên rêveberîyê hemûyan bi nivîsandina bi kite kit a mijarên civînê hemûyan vedixwîne civînê yan jî ji wan dixwaze dengê xwe bi rêya nivîsê bidin. Rêveberî dikare biryaran bide heger herî kêr nîvê endamên wê di civînê de amade bin. Ji bo biryara bi dengdana nivîskî jî lê be, divê herî kêr nîvê endamên rêveberîyê beşdar bin.

(2) Heger destûra weqfê bi regekî din dîyar nekiribe, biryar bi piranîya besît a endamên hazir yan jî bi piranîya endamên bi rêya nivîsê dengê xwe dayî, tên dayîn. Heger dengên ji bo û li dijî weke hev bin, dengê seroka/ê rêveberîyê dîyarker e.

(3) Ji bo civînen rêveberîyê divê protokolek bê amadekirin ku divê her carê rêveberê civînê yê ku di destpêka civînê de tê dîyarkirin jî wê îmze bike. Herçî biryar in, divê gotin bi gotin di vê protokolê de bîn nivîsandin.

§7

Wezîfeyên rêveberîyê, wekalet

(1) Rêveberî hem weke şexsê hukimî û hem jî li derveyî dadgerîyê nûnerîya weqfê dike. Ew beramberî qanûnan wasîyê weqfê ye. Serok û her wiha cîgira/ê serokê/î her yek ji wan xwedîyê wî mafî ye ku nûnerîya weqfê bi serê xwe bikin. Endamên din ên rêveberîyê yên mayî bi xwe, her yek ji wan heger endameke/î din ê rêveberîyê bi wan re be, tenê hingê xwedîyê mafê nûnerîya weqfê ne. Serok û cîgira/ê serokê/î ji sînardarkirinên § 181 ya BGB'yê [BGB=Qanûna Medenî ya Elman] azad in.

(2) Rêveberî weqfê li gorî pîvanên destûra weqfê bi berpirsîyarîya xwe bi rê ve dibe. Gava ew vê dike, divê ew heta ku mumkin e tesîrker û mayînde vîna xwedîyê weqfê bi cih bîne. Li ser endamên rêveberîyê ferz e ku îdareya malê weqfê û derfetên wê yên din ên darayî biînsaf û biteseruf bikin. Nexasim ji wezîfeyên rêveberîyê ye

1. dîyarkirina plana budceyê ji bo weqfê;
2. biryardayîna li ser bikaranîna dahatên ji maldarîya weqfê û pereyên ku li vê maldarîyê nayên zêdekirin;
3. nivîsandina rapora li ser bicihanîna armancên weqfê û muhasebeya salê ya dahat û mesrefên weqfê û li ser malê weqfê (§ 11 bend 2)

(3) Rêveberî dikare nîzamnemeyekê [destûreke ji bo karên rêveberîyê] ji bo xwe amade bike. Ji bo vê erêkirina Desteya Şewirmendîyê pêwîst e.

§8

Desteya Şêwirmendîyê, Serok

(1) Desteya Şêwirmendîyê ji 3 ta 5 endaman pêk tê, erka xwe divê xwebexş û bê pere bi cih bîne. Lê belê ji mafên endamên Desteya Şêwirmendîyê ye ku doza tezmînkirina mesrefên xwe yên pêwîst bikin.

(2) Endamên Desteya Şêwirmendîyê ya pêşî di dema karê mueseseyê weqfê de tîn wezîfedarkirin, hemûyên paşê Desteya Şêwirmendîyê bi xwe wan wezîfedar dike. Heger wê hejmara endamên desteyê ji ya herî kêmtir bibê ji ber veqetîna endaman, Desteya Şêwirmendîyê divê tawilê şûna yên veqetîyayî dagire. Heger hejmara endamên Desteya Şêwirmendîyê ji hejmara herî kêmtir bibê, endamên mayî yên Desteya Şêwirmendîyê heta ku hejmar bê temam kirin, bi tena serê xwe Desteya Şêwirmendîyê pêk tînin. Endamek dikare careke din jî bê wezîfedarkirin.

(3) Desteya Şêwirmendîyê ji nava xwe serokekê/î û cîgira/ê serokê/î hildibijêre.

§9

Biryardayîna Desteya Şêwirmendîyê

(1) Desteya Şêwirmendîyê biryarên xwe di civînan de yan jî bi rêya dengdayîna nivîskî dide. Serok yan jî Cîgira/ê Serokê/î, endamên rêveberîyê hemûyan bi nivîsandina bi kite kit a mijarên civînê vedixwîne civînê yan jî ji wan dixwaze dengê xwe bi rêya nivîsê bidin. Desteya Şêwirmendîyê dikare biryaran bide heger herî kêmtir nivê endamên wê di civînê de amade bin. Ji bo biryara bi dengdana nivîskî jî lê be, divê herî kêmtir nivê endamên Desteya Şêwirmendîyê beşdar bibin.

(2) Heger destûra weqfê bi rengê din dîyar nekiribe, biryar bi piranîya besît a endamên hazir yan jî bi piranîya endamên bi rêya nivîsê dengê xwe dayî, tîn dayî. Heger dengên ji bo û li dijî weke hev bin, dengê seroka/ê Desteya Şêwirmendîyê dîyarker e.

(3) Ji bo civînen Desteya Şêwirmendîyê divê protokolek bê amadekirin ku divê her carê rêveberê civînê yê ku di destpêka civînê de tê dîyarkirin wê îmze bike. Herçî biryar in, divê gotin bi gotin di vê protokolê de bînin nivîsandin.

§10

Wezîfeyên Desteya Şêwirmendîyê

- (1) Desteya Şêwirmendîyê destekê dide rêveberîyê di dema karê wê de û wê kontrol dike. Karê wê nexasim jî biryardayîna li ser
- a. pêşniyazên ji bo îdareya malê weqfê û bikaranîna derfetên darayî yên weqfê;
 - b. bikaranîneke malê weqfê li gorî § 3 bend 3;
 - c. rapora salê ya weqfê li gorî § 11 bend 3;
 - d. lêfihêlkirina rêveberîyê;
 - e. wezîfedarkirin û jiwezîfeyêgirtina endamên rêveberîyê;
 - f. wezîfedarkirin û jiwezîfeyêgirtina endamên Desteya Şêwirmendîyê;
 - g. erêkirina nîzamnameya rêveberîyê.

(2) Wekî din Desteya Şêwirmendîyê biryarê dide li ser guhertinên destûra weqfê, fesixkirina weqfê û bi weqfeke din re yekkirina wê li gorî §12'ê.

(3) Desteya Şêwirmendîyê dikare ji bo xwe nîzamnameyekê dîyar bike.

§11

Îdareya mueseseyê, û sala darayî

(1) Saleke darayî saleke salnameyî ye.

(2) Rêveberî divê dahat û mesrefên weqfê qeyd bike û belgeyên wan berhev bike. Di dawîya her sala darayî de divê lîsteyên li dahat û mesrefên weqfê û li ser maldarîya wê, her wiha raporeke li ser bicihanîna armancên weqfê bîn amadekirin.

(3) Desteya Şêwirmendîyê kontrol dike û biryarê li ser belgeyan dide li gorî paragraf 2 fiqre 2 ka ew weke rapora salê tînen qebûlkin yan na.

(4) Rêveberî dikare midûrekê/î meuseseyê ji bo weqfê dîyar bike yê ku ne lazim e ilehî endamê rêveberîyê be. Heger derfetên darayî yên weqfê destûrê bidin, mirov dikare pereyekî bide vê/vî kesê/î.

§12

Guhertina destûrê, fesixkirina weqfê, yekkirina bi weqfeke din re, maldarî

(1) Biryarên ku wê destûra weqfê biguherin, wê li gorî paragraf 2 bi piranîyeke besît ya endamên Desteya Şêwirmendîyê yên hazir yan jî piranîya besît a endamên Desteya Şêwirmendîyê yên ku nivîskî dengê xwe dayîn, bîn dayîn.

(2) Biryarên li ser guhertina destûra weqfê yê elaqedarî armanca weqfê, yan jî yê elaqedarî fesixkirina weqfê, yan jî yê li ser yekkirina bi weqfeke din re tenê dikarin bîn dayîn heger tevahîya endamên Desteya Şewirmendîyê hazir bin û tevahîya endamên Desteya Şewirmendîyê erê bikin. Biryarên bi vî rengî tenê hingê destûrdayî ne, heger şert û merc ewçendê biguherin ku êdî bicihanîna armanca weqfê êdî ne manedar xuya be.

(3) Gava weqf bê fesixkirin yan jî armancên bi imtîyaza bacê nemînin, hingê divê maldarîya wê bidin kesayeteke hukimî ya hiqûqa giştî yan jî sazîyeke din a ku kesayeteke hukimî ye ya ku dikeve ber imtîyaza bacê; ev jî dibe bi şertê ku ev maldarî tenê û yekser ji bo zanist û lêkolînê, yan perwerdekirina miletî û pîşeyî yan jî huner û çandê bê bikaranîn.

§13

Wesayeta îdarî ya dewletê

(1) Weqf dikeve ber wesayeta îdarî ya Berlînê li gorî qanûna weqfan a Berlînê.

(2) Li ser endamên dezgehên nûnerîya weqfê li gorî § 8 StiftG Bln [StiftG Bln= Qanûna Weqfan a Berlînê] ferz e ku ji meqamê wesayeta îdarî re

1. tavilê her carê pêkhatina dezgehên weqfê tevî dabeşkirina wezîfeyan di nava van dezgehan de ragihîne, van belge bike (Protokolên hilbijartinê, belgeyên wezîferdakirinê, danezanên qebûl û îstîfayê yan jî belgeyên ku delîl in) û navnîşana weqfê û navnîşanên endamên dezgehên nûnerîyê ragihîne;

2. rapora salê ya li gorî §11 bend 3 hatî erêkirin bigihîniyê; ev yek divê di nava 4 mehên piştî qedîyana sala darayî bibe; biryara Desteya Şewirmendîyê jî divê pê re bê şandin.

3. Ji bo biryarên li ser guhertina destûrê, fesixkirina weqfê yan jî yekkirina wê bi weqfeke din re destûra meqamê wesayeta îdarî ya dewletê lazim e. Miracaeta ji bo vê destûrê divê bi destê wan endamên rêveberîyê yê li gorî § 7 bend 1 mafê wan e nûnerîya weqfê bikin, li cem meqamê wesayeta îdarî ya dewletê bê kirin.
